Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (260) | Çileya Paşîn / 01-01-2024

# Welatî hêvî dikin 2024 sala azadî û bidawîhatina pirsgirêkan be



Kurdistan

Ji sala 2011'an û heta niha xelkê Kurdistana Sûriyê êş û azaran dikşînin, û sal li pey salê hêvî dikin ku rewşa wan baştir bibe. Rojnameya Kurdistan nerîna hejmareke welatiyan li ser hêviyên wan di sala 2024'an de stand. Welatiyek wiha dibêje"Ji destpêka şoreşa Sûriyê û ew di rewşeke xerab de dijîn, û berdewam hêvî dikin ku di sala nû de jiyana wan xweş bibe û ewlekarî berqerar bibe". Welatiyekî din jî wiha dibêje"Hêvî dikin sala 2024'an bibe sala çareserkirina pirsgirêkan li Kurdistana Sûriyê û vegera hemû merivên me yên ji derve, û deverên me bêne avakirin û xizmetguzarî werin dabîn kirin heta ku xelk di jiyaneke xweş û azad û bi rûmet de bijîn, dûr ji êş û azaran". Welatiyek jî dibêje, ew dixwazin di jiyaneke aram de bijîn bê şer û nakokî û hemû aliyên Kurdî lihev bikin heta me ji van pirsgirêkan rizgar bikin.


## Ala Kurdistanê nasname û rûmeta me ye



Nivîskar û rojnamevan Şêxo Efrînî behsa Ala Kurdistanê û wateya wê ya giring li cem miletê Kurd dike û wiha dibêje:" Gel bi ala xwe naskirî ye, di her korbend yan civîneke de, alên hildayî nîşan û nasnameya her beşdarbûyekî didin naskirin, rast e em Kurd nebûn xwedî welatekî serbixwe, lê em xwedî xak, al, gel û nasname ne, divê em pê ve werin girêdan da ku hezkirin û dilgermî zêde bibin, wan hest û nestan radestî nifşekî din bikin". R...3

## Mûsa Zaxoranî ji nav me bar kir

Helbestvan û Nivîskarê Mûsa Zaxoranî roja 19.12.2023an ji ber nexweşiyê li nexweşxaneyeke Hewlêrê di temenê 68 saliyê de koça dawiyê kir. Mûsa Zaxoranî sala 1952an li gundê Letîfiyê yê ser bi Qamişlo ve ji malbateke kurdperwer jidayîk bûye. Ji ciwaniya xwe ve jî dest bi karê siyasî û nivîsînê kiriye. R...4




**Koçberî li Kurdistana Sûriyê û bandorên wê** *Rûpel—2*

**Pêwistiya Fedrasyona Nivîskarên Kurdistan li Diaspora** *Rûpel—3*

**Hemî rojên sext û dijwar** *Rûpel—4*

# Koçberî li Kurdistana Sûriyê û bandorên wê

Hêvî Delî-Qamişlo

Diyardeya koçberiyê li cîhanê bi hemî sedemên xwe ve babeteke giring e, bi taybetî li Kurdistana Sûriyê ku piştî şoreşa Sûriyê 2011'an, û êrîşkirina Tirkiyê û komên çekdar yên bi ser wê ve, û binpêkirinên berfireh ku der herqê xelkên Herêmên Kurdî kirin mîna Efrîn, Serêkaniyê, Girêsipî û Kobanê ji kuştin, revandin, girtin, işkencekirin talan û wêrankirin û destdanîna ser xanî û zeviyên welatiyên Kurd, ev yek bû sedema koçberî û derbederbûna xelkê ji deverên xwe ku neçar bûn berê xwe bidin welatên cîran û hin ji berê xwe dan navçeyên din yên Sûriyê, beşek ji koçberan di kampên penaberiyê de niştecihbûn, jiyaneke metirsîdar di nav rewşeke dijwar û aloz de ji hemû aliyên ve dijîn, ji tunebûn û kêmbûna peydakirina xizmetguzariyên sereke yên pêwîst wek av, elektirîk, paqijî, tendirustî, dibistan, û ji bilî vê yekê bi hatina demsala zivistanê re koçber di rewşeke zêde xirab de ji ber sedema lehiyan û kombûna avê di konên wan de bê ku ti çareserî ji van pirsgirêkan re wer dîtin, û beşekî din ji koçberan li bajarên Qamişlo, Amûdê, Dirbêsiyê û hin navçeyên din niştecihbûn, ku ew gilî û gazinan dikin derbarê bilindbûna berdewam ya buhayê nirxê kirya xaniyan bi rêjeyeke mezin di demekê de ew di rewşeke hejariyê de dijîn bê ku ti alîkarî ji wan re were pêşkêşkirin, koçberên li Kurdistana Sûriyê dimînin rastî zehmetiyan dibin di dabînkirina xwestekên zarokên xwe de, ji vê yekê malbat neçar dibin zarokên xwe ji xwendinê dûr bixin û wan tevlî kar bikin ji bo debara jiyana xwe bikin, êdî êş û derdên wan bi dawî nabin ta ku venegerin ser mal û milkên xwe, û ev yek jî vedigera li ser civaka navdewletî ta wan komên Çekdar yên bi ser bi Tirkiyê ve ji herêmên Kurdistana Sûriyê derxînin, ta aramî û bawerî li cem nişteciyên wan herêman çê bibe ji bo vegerin ser mal û milkên xwe.

> **Bandorên koçberiyê metirsîdar in**

Herwiha ji aliyekî din ve koçberî û rewşa xirab û bandora wê li ser pêşeroja zarokan li Sûriyê, ku zarok beşê herî zêde di şêrê 12 salan yê Sûriyê bacê didin, ku zêdetirî milyonek zarok ji mafên xwe yên bingehîn bêpar mane, weku perwerde, xwendin ku kêşeyeke herî mezin e rûbirûyî wan dibin, êdî ev yek dihêle ku jiyan û pêşeroja zarokan li Sûriyê di bin metirsiyê de be ku rêjeyeke mezin ji zarokan li Sûriyê bi giştî bi taybetî li Kurdistana Sûriyê ji xwendina xwe dûr ketine û êdî ew tevlî bazara kar dibin, û karên dijwar û metirsîdar de dixebitin ku ne li gorî temenê wan yên biçûke ji bo alîkariyekê ji malbatên xwe re pêşkêş bikin û her ev yek vedgere ji rewşa aborî ya xerab ku sedema sereke ye ji belengazî û hejariya welatiyan û bandorê li ser civakê û jiyana xelkê dike, û nexasim piştî derketina koçberiyê û derbederbûna xelkê ji welatê xwe.




> **Ji ber koçberiyê gelek zarok bê xwendin mane**


Di demekê de ku herêmên Kurdî wekî em dibînin ku roj bi roj rewş aloztir dibe û gelek malbat koçber in û hejar in û zehmetiyan dibînin û pêwîstiya wan bi alîkariyê heye ji vê yekê ew neçarin zarokên xwe ji xwendin û dibistanê dûr bixin û wan tevlî bazara kar bikin ji ber peydakirina xwestek û pêdeviyên malê derbarê vê rewşa ku ew bi zehmetî jiyana xwe têde derbas dikin, taybetî di vê salê de ji ber zehmetbûna dabînkirina pêdviyên perwerdehiyê û pêdawistiyên dibistanê yên bingehîn û buhabûna nirxê wan û her ji sedema dûrbûna dibistanê ji malên wan û bilindbûna nirxê kirya otomobîlan û ev yek dibe barekî giran li ser milê malbatan, di demekê de ku xwendin mijareke bingehîne divê were parastin ji bo misogerkirina pêşeroja şagirtan û avakirina nivşekî azad û pêşarojeke geş.

Li Kurdistana Sûriyê diyardeya tevlîbûna zarokan di nava karê giran de, ku hejmara zarokên dixebitin zêdebûye, ev yek vedigra ji kêmbûna karkerên temen mezin ji sedema koçberiyê, û êdî xwediyên kar neçarin zarokan tevlî kar bikin û ew jî bi razîbûna malbatên wan him ji bo fêrkirina kar û him ji bo alîkariya malbatê di vê rewşê de.

> **Divê hemû koçber vegerin ser mal û milkên xwe**

Di vê çarçoveyê de jiyan û pêşeroja zarokên Sûriyê di bin metirsiyê de ye, ku êdî ew rûbirûbûna kêşeyên dijwar ên civakî, aborî, û mirovî tên, ji ber kar û keda wan di temenekî biçûk de yek ji wan kêşeyên herî mezin e ku rûbirûyê wê dibin, û ev yek zirar û bandoreke neyênî dide tenduristî, geşepêdan, xweşiya wan, û ji mafê wan bêpar dihêle. Êdî rewşa aborî ya zehmet e û tunebûna aramiyê û mafê zarokan li Kurdistana Sûriyê dibe kelem li pêşiya pêkanîna xewn û hêviyên wan.

# Ala Kurdistanê nasname û rûmeta me ye



Şêxo Efrînî

Hewlêr

Gel bi ala xwe naskirî ye, di her korbend yan civînekê de, alên hildayî nîşan û nasnameya her beşdarbûyekî didin naskirin, rast e em Kurd nebûn xwedî welatekî serbixwe, lê em xwedî xak, al, gel û nasname ne, divê em pê ve werin girêdan da ku hezkirin û dilgermî zêde bibin, wan hest û nestan radestî nifşekî din bikin. Di 17ê Berçileya her salekê de, ala Kurdistanê tê bibîranîn, ku Perlemana Herêma Kurdistanê sala 2009'an weke Roja Ala Kurdistanê li hemû deverên herêmê bi fermî ragihandiye. Di her salekê de kolan, tax, bajar, bajarok û gund bi hildana ala Kurdistanê dixemilin.

Kesên welatparêz, li her çar perçeyên Kurdistanê, û li revenda Kurdî li Ewropa, parzemîn û welatên din, roja Ala Kurdistanê pîroz dikin, ji raya giştî re didin naskirin ku ala welatekî bindest û dagîrkirî ye, û ji mafê 50 milyon Kurd e bi welatekî serbixwe şa bibin.

Çawa emê vê alê ji xwe re weke sembol nebînin, û li Komara Kurdistan li Mehabada Rojhilata Kurdiatnê sala 1946'an hatiye hildan, rêber û serokê komarê şehîd Qazî Mihemed, radestî Mela Mistefayê Barzaniyê nemir kiriye, ew jî li ser parastina alê berdewam kiriye, bi hezaran Pêşmergeyên dilsoz canê xwe kirine qurbaniya xaka pîroz di bin alê de şehîd bûne, û bûye nîşana her şoreşekê di Îlon, Gulan, Raperîna 91ê û bi dehan hewlên rizgarîxwaza Kurdistanê de, ta bi fermî li Herêma Kurdistana azad, piştî hin destêwedan hatiye kirin, hatiye pesendkirin.

## Rengên wê

Ka hinekî em li ser reng û wateyê wê rawestin, ji jor ve, rengê sor, nîşana xwîna şehîdan xebata ji bo azadî, rûmet û serbestiyê ye. Rengê kesk, nîşana siruşt û xwezaya Kurdistanê ye. Rengê zer nîşana jiyan û jêdera mirovan e, 21 tîrêjên rojê di naverasta alê de nîşana 21'ê Adara sersala Kurdî û Newroza Kurdî ye. Rengê spî nîşana aştî û wekheviyê ye.

Erk e, li ser welatparêzekî xwedî li vê alê derkeve, dîroka wê baş nas bike, û hizkirina wê berdasî dilê zarokên xwe bike tê de biçîne, erkekî mezin li pêş revenda kurdî ye ku cîhanê bi vê alê bidin nasîn û naskirin, piştre êş û derdeseriya gelê kurd, stembarî û zordariya ku hatiye serê wî gelî bibin wane û pênasîn berbelav bibin.

Roja Ala Kurdistanê li gelê Kurd pîroz dikin, bi hêvî ne roja ku Serok Mesûd Barzanî û niviyên Barzaniyê nemir ên ciwan her du birêz Nêçîrvan Barzanî, Serokê herêmê, û Mesrûr Barzanî Serokê Hikûmetê, ala pîroz berev Kurdistana mezin bibin, bibînin û li ser her bajarekî dagirkirî hildin, û çavên Kurdistaniyan pê geş bikin.

> **Bi hezaran Pêşmergeyên dilsoz canê xwe di ber Ala Kurdistanê de kirin qurbanî**

---

# Pêwistiya Fedrasyona Nivîskarên Kurdistan li Diaspora



Sedîq Şirnexî

Diyaspora me Kurdan îro bûye wek Kurdistanek li derveyî welat, tu dibîne hem welatiyê te û welatiyên her çar pareyçên Kurdistanê li kêleka hev in û rojane êş û azarên xwe parve dikin, têkilyên xwe ava dikin.

Komele û Malên Kurd dadmezrînin li gor hebûna xwe, ev asta nû ji xebata Kurdistanî derveyî welat tiştekî erênî û baş e.

Ji ber zulm û zorê li welatê xwe di van 30-40 salên dawî de, ne tenê wek xwendevanê berê ku dihatin, ev rewşa nû ji penaberiyê pir tiştan bi xwe re tîne, yek jê hişmendiya welatên em têde dijîn, hizra demokrat ku wan pê welatê xwe ava kirine, rewanê pêkvejyanê bi biyaniyan re.

Helwesta me çibû? Em xwe bi xwe wek Kurdên çar parçeyan bo naskirina zaravayên xwe yên cuda û carna dab û nerîtên nû ji bo me ezmûnek nû bûye. Mînak Kurdên Rojava û Bakur û Sovyêta berê dikarin têbighejin bi zaravê xwe di peyvê de, di heman demê de bi tîpên latînî di nivîsandinê de.

Li hêla din Kurdistaniyên ji Başûr û Rojhilat bi taybetî Soran wek nimûne zaravake kêm tê fêm kirin ji bal Kurdistaniyên parçeyên din, herweha nivîsandina wan jî bi tîpên Erebî ye guhertiye. Çimkî em îro li pênc Navendên Cîhanê hatine belavkirin ne wek ti demên bûrî, û berî niha Kurdên her parçeyekî li penaberiya xwe hev didîtin, renge yekîtî û federasyon çêbûn lê piştre berfireh bûn ta ku giha asteke konfedrasyonên mezin pêk hatin nemaze li Ewropa .

Bi rastî nema edî komele û malên Kurdî têr kirin ku têkiliyên giştî û berfireh bikin divyabû Fedrasyonê jinan an rewşenbîran herwiha yên ciwanan çê bibin.

Me jî wek nivîskarên Kurdistanî piştî hebûna xwe ya li ser pênc Parzemînan tekez kir, me biryar da ku em rola xwe ya li Diyasporayê bibînin, pêş bixin ji bo avakirna desteyek ku van kesayetiyan di çarçoveyekê yekgirtî de li hev kom bike li ser çar bingehan:

**Yekem:** Hemî zaravên Kurdistanê bi herdû rênivîsan beşdar bin ji nivîskaran.

**Duyem**: Ji her çar parçeyan hebin digel Kurdên Sovyata berê.

**Sêyem:** Jin û mêrên nivîskar bihev re xwedî bandor bin di vî karî de.

**Çarem:** Baweriya me ya netewî yek be bi Ala Kurdistan, sirûda netewî. Em serbixwe ne hember partyên siyasî yên Kurdistanî.

**Me çi xwest bêjin?**



Piştî zêdetir ji sê mehan ji peywendiyan em gihiştin dema ragihandina vê yekîtiyê bi navê "Fedrasyona Nivîskarên Kurdistan li Dyaspora" .

Bê guman ev karê giranbuha wê şaxek bê ji dara Konfedrasyona Revenda Kurdistanî de ya ku sîwaneke mezin e di xizmeta yekîtiya xebata Kurdistanî li Diyaspora.



Henan Cefer


# Sê wêne

Wêneya yekemîn
- Pêgera min lêket ... berî li rewşa û dema min bipirsê got "ez ji te hez dikim" lê min dengê wê nasnekir, cara yekê bû, lê di şêweya dengê wê re min gûman kir.. min kê bipirsiya tu kî ye ji quretiya xwe bêdeng bûm min got tu min nas dike... kenekî tinazî û bilind pêket ji fedîbûn re min lêborîn jê xwast û min got ez pir mijûlim kêlîkekê ezê li te bigerim... di nava xwe û xwe de ponijîm û bi xwe keniyam şêweya dengê yara min e lê ger ew ba çima negot ez im!!
- Min telefûn jê re lêda û tavilê min got şîlan çawayî got
- Baş im
Û ez jî pirtir ji te hez dikim, ez dixwazim em bi hev re bimeşim eger tu amadeyî. Em dimeşiyan di rêya paporê(zift) re me dît du jin bi beraşê (destar) dihêrin, em çûn ba wan û me wêne yên xwe bi wan re girtin û min jê pirsî ev destar çend salin peyda bûye heye û çi tînê bîra te?
- Yawrim ev destara pir Kevin e ji sed salan de heye, berê şûna aş digirt lê dema aşê avê çê bû xelkê nûsk, savar, firîk û gilgil dihêran. Bîstekê sekinî û kenîîî û kenî berî çîrûka xwe bêje em jî keniyan got li ber vê destarî ez hatim xwastin... rojekê min alîkariya Ela xatûn dikir bi min re got eger dilê te li kurê min heye ezê te bikim bûka xwe bi gotina bûka xwe re hest û hişê min bi savarê re hatin hêrandin, herbilîm, soromoro bûm nepeyvîm li min mêze kir û got bersiva te gihişt min.

Wêneya duyemîn
- Piştî xatirxwestinê em meşiyan di rêya ber gelî re, dirêêêj bû mîna pêla derya yê, baran hûr dibarî wek peşkên xunavê, em çûn rastî cewlikê hatin komek jin, mêr û zarok li hewşê civiyan e, çavê dayîkê li me ket em li wan temaşe dikin ber me hat û em vexandin şahiyê, dema em ketin hewşa cewlikê "şekalvekirina mendal e" nû bi meşê ketiye, dayîkê kir hembêza xwe û ciwanekî biçûk hat benîkê bi her du şekalan ve girêdayî bi cawbirê biriya û tûrikê tamtîtik revand ji aliyê zarokan ve bi şekalan dan dû û avêtinê li dawiyê hemû zarok li tûrikê tamtîtik hatin hev û her yekî/ê pare xwe stand... ji aliyê din ve xwarin, mîwe û şêrînî danîn ser
Masê û me wêne yên xwe bi wan re kişandin.

Wêneya sêyemîn
- Me ger û seyrana xwe berdewam kir di nav mêrg û baxçeyan re dîmenên xweşik digel awaza balinde, çirçirk û xuşîna daran ve ramanên mirov nûjen dikin mîna tevna dayîka min dîmen hûnandiye û ravekiriye sirûştê kirasê rengîn bi ser bejna xwe de berdayî,xemlandî û sîdara darên rengê zerbûna payizê bû, her em diçûn çardor û deng dihat guhartin, hêdîbûn, bawerî û aşitî nû bi wêneyan re çê dibûn, her ku em çûn wîrrûrra beqan nîzîk dibû piştî demek kurt wîrrûrra beqan qut bû, em gihîştin pengavê(gola biçûk) çend zarok li wir dilîstin ji tirsa zarokan re beq bêdeng bibûn. Dema zarok çûn û em li rex pengavê rûniştin û me destê xwe kir destên hev û bi vê dîmenê arraman dibûn û bi dil evînî me nazê xwe bi hev dikir mezinê beqan bi dengekî ji xwe bawerî got netirsin evna dildarin dil û hestên wan bi evînê meyandî ye ti ziyanê bi me nakin tersî wanin û bû wîrrûrra beqan hatin bi rêz rawestîn û xwe xûz kirin ji evîntiyê re, mezinê beqan ji aliyê xwe ve û bi nave hevalên xwe got "em evîna we pîroz dikin" me ji aliyê xwe ve spasiya wan kir bi aşîtî bijîn û min pirsî çima derdora we gemar bûye? Gilêş belav kiriye, mezinê beqan got êvara çûyî çend rêwî rih dirêj û fîstan li bejnê wan bi çek û rext bûn sîwarîkê wan li bar bû, piştî nimêj kirin û xwarin her tiştê mayî avêtin û cilên xwe mîna maran guhartin, binçengên wan porê reş û bêhna genî jê dihat û carek din evîna we pîroz dikim, hêvîdarim paşeroja we kamîran be lewra ji aliyê xwe ve me derdor paqij kirin û me wêneyên xwe kişandin...

## Hemî rojên sext û dijwar



Hiyam Ebdulrehman

Hemî rojên sext û dijwar
bila herin
venegerin
barbikin û bişûn xeda
ne zivirin
evan rojê sext û dijwar
gelek dilê me êşandin
gelek mirovên ne hêja
Em xapandin
Hemî rojên
sext û dijwar
em gevaztin
dinêv êş û janê dijwar
em dixewstin
ta go diman lar û hejar
û nûke mestin
bila rojên sext û dijwar
dûr bikevin
da mirovê pak û hêja
livbicivin
û serkevin
dako êdî em
aram bibin
û bikenin
paşî binivin



Vanês Mîranî

# Aşiqê peyva nazik ji nav me bar kir

Nivîskar û helbestvanê navdar Mûsa Zaxoranî ( Bavê Gulê) endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyê bû, kesayetiyeke Kurdperwer, niştîmanperwer, welatparêz û xebatkarekî doza netewî ya Kurd bû.
Bi sedema nexweşiya penceşêrê roja Sêşemê rêkeftî 19.12.2023an, bê guman piştî têkçûna rewşa wî ya tendirustî, li nexweşxaneya Rojhilat li Hewlêra paytexta Herêma Kurdistanê di jiyê 68 saliyê de koça dawiyê kir.
Zaxoranî bejneke mezin û bilind bû di meydana rewşenbîriya Kurdî de, helbet wê koçkirina wî ziyaneke pir mezin be ji gelê Kurd û Kurdistanê re. Hêviya ku Yezdan wî bi behişta berîn şad bike.
Bila serê dost, heval, hûgir û kesûkarên wî sax be û Xwedê sebir û hedarê bide malbata wî, wê bi wan peyvên nazik û helbestên xwe di dilê xelkê xwe de bimîne sax û zindî. Mûsa Zaxoranî, navê wî yê rast û dirust Mûsa Osman Xelef e, naskiriye bi Mûsa Zaxoranî di sala 1955'an de hatiye jiyanê, li gundê Letîfiyê, li ser sînorê Tirkiyê û Sûriyê, rojhilatî Qamişlo.
Xwendina xwe ya seretayî li gundê xwe xwend, û her şeş salên din li dibistanên Qamişlo xwend, û di sala 1973'an de bekeloriya wergirt.
Li çend cihên din gelek korsên xwendinê birine, nemaze li ser markisîzmê û tevgera karkerê cîhanê û aboriya siyasî. Her di wan korsan de di nav yekemînan de bû.
Ji sala 1969'an ve helbest bi Kurdî û Erebî hûnandin e. Di gelek rojname û kovarên Kurdî de nivîsiye, û helbestên wî hatine belav kirin di van kovaran de : ( Metîn - Stêr - Gelawêj - Gurzek gul - Zanîn - Peyman -Rojhilat -Peyv -Xebat -Teaxî -Roj ... hd ).
Di hemî festîvalên helbestê de beşdarî dikir û di hemî bîranînên xebatkarên Kurd û şîn û şahiyên gelê Kurd de amade dibû.
Endamê Komîta Mehrecana Helbesta Kurdî li Sûriyê bû ya sala 2007'an de, yek ji damezrênerê koçka Qamişlo ya çanda Kurdî bû.
Hemî cûrên helbestê û li ser pir babetan helbest hûnandine, û gelek êş û girtin û lêdan xwariye di ber kêşa Kurdî de.
Di sala 2011'an de ji ber ku beşdar dibû di hemû xwepêşandanên li dijî rejîma Sûriyê çi bi şev û çi bi roj, û dema ku ji Herêma Kurdistanê vedigeriya li dergehê Qamişlo û Nisêbînê dihate girtin, bi zindan zindan gerandin ta li zindana ( El feyha ) qefandin, her di wê demê de gelek zorî û lêxistin û êşandin û işkence kirin dîtiye, û her li hemû navend û senterên polîs û emin û asayîşan de lêdan ji rejîmê xwariye û zor lê hatiye kirin ji Qamişlo ta zindana ( Filestîn ).
Herwisa ji bo mafê gelê Kurd û Kurdisanê di gelek şandan de beşdar bûye û her li pêş bûye, û diwemîn lîste ya ku li ser rewşa pirsgirêka Kurd li Sûriyê radestî Serokwezîrê Hikumeta Sûriyê yê wî wextî ( Ebdulreûf El-kesem ) kiriye.

**Berhemên wî yên çapkirî ev in :**
1- Govendek Helbest 2009
2- Bûka Helbestan 2022
3- Landika Helbestan 2023

**Xelat û bawernameyên wergirtin ev in :**
- Xelata helbestvan mela Nûrî yê Hesarî ji Y.N.R.K.S



- Xelata helbestvan Emerê Lalê ji malbata wî.
- xelata sipasnameyê ji rêkxirawa canî roj.
- Xelata rêzlêgirtinê ji Şaxê Duhokê yê Yekîtiya Nivîskarên Kurdistana Sûriyayê sala 2022
- Xelata sipasdariyê ji rêkxirawa ( NRC ) ya Emrîkî.
- Xelata Sendîka Hunermendên Kurdistan - Rojava sala 2022
- Xelata Dezgeha Parastina Alaya Kurdistan li Hewlêr sala 2023